



Kurdekî welatparêz ê  
“Kurdiştana Sor” koça  
dawiyê kir

»»» R:4



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdi](http://www.kurdistanmedia.com/kurdi)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (348) 22-04-2019 Buha (1000) Tûmen

Birêz Mistefa

Hicrî peyamek

rû li kirêgirtî û

mohreyên girê-

dayî rejîmê belav

»»» R:3



Faşîzm di  
kincê çep de

»»» R:2



## Spaha Pasdaran çavkaniyek ji bo terorê

Spaha Pasdaran a Rejîma Îranê ku ji aliyê Xomênî ve hatiye avakirin, piştî bi dehan salî kuştar û teroê di asta navneteweyî de, wekî saziyeke terorîstî hate nasîn. Amerîkayê bi awayekî fermî Spaha Pasdaran roja 19-ê Xakelêweyê xiste nava rêzbenda girûpên terorîstî de.

Di van rojên dawiyê de piraniya nûçegihaniyên cîhanê ji zimanê berpirsyarên payebilind ên Amerîkayê ve çendîn rapor û nûçe derheqê xistina Spaha Pasdarna di nav rêzbenda girûpên terorîstî de weşandin, ku dijkirrarên curbicur ji aliyê berpirsyarên rejîma Îranê û Spahê ve, li pey xwe hebû.

Herwisa Wezaretê Karê Derve ya Erebiştanê biryara Amerîkayê wekî biryareke hêja û di ciyê xwe de bi nav kir, û jê piştgirî kir. “John Bolton” Şêvirmendê Karûbarên Ewlehiya Neteweyî ya Amerîkayê jî ragehand ku nabe tu kesek bi vê saziyê re bikeve nava têkiliyan de.

“Brian Hook” jî berpirsê karûbarên têkildar bi Îranê di Wezaretê Karê Derve a Amerîkayê de jî ragehand: Spaha Pasdaran her ji roja avabûnê ve heya niha jî gefeke cidî li dijî hêzên Amerkayê bûye. Nûnerê Misilman Amerîkayê di Meclisa Nûneran a vî welatî de jî ragehand: Ew biryar dikare bibe sedema çêbûna şer jî. “Mike Pompeo” jî ragehand: Alava herî girîng ji bo belavkirina terorê, Spaha Pasdarn e. Berpirsyarên Amerîkayê pêşwaziyeke baş ji vê yek kirin. Herwisa “Benyamin Ntnayahu” serokwezîrê Îsrailê jî di peyamekê de ji biryara Amerîkayê piştevanî kir.

Her di vê derheqê de rêzdar Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ jî bi weşandina daxuy-



aniyekê ji bo raya giştî ragehand:

“Her ji vir ve, li ser navê PDKÎ ez careke din rûyê axavtina xwe didim hemû wan kesan, bi taybet endamên Spaha Pasdaran yên Kurd ku li her cihekî bin, vegerin himbêza gel û nîştiman, heya ku dereng nebûye, xwe ji tawanên ji niha şûnda yên Spaha Pasdaran dûr bixin. Partiya Demokrat li ser bingeha bihêzkirin, qahîmkirin û paraştina kirameta mirovî a Kurd û xebat bo mafên wê ên neteweyî hatiye avakirin, û di vê biyavê de siyasetê dike. Her bi vê sebebê ye jî ku naxwaze di siberojê de, takên Kurd bi navê terorîst bêne kelepçekirin, yan jî berbirûyê dadgehên dijîmîrovî bibin, çi li Kurdiştanê û çi jî di cîhanê de.

Hewce ye ên ku heya îro bi her hincetekê endamê Spaha Pasdaran bûne, vê bangewaza Partiya Demokrat micid werbigrin, çimkû piştî êdî tu kesek nikare ji bo kiryarên terorîstan û xulamokên wan, hêcetan bîne.

Komara Îslamî di heyama 40 sal temenê xwe de, hewl daye ku hindê Kurdên bînefs, wekî Caşpasdar, Besîc û ...hwd di Rojhilata Kurdiştanê de birêkxiştin bike. Lê, hekî ew kesane heya duh jî wekî alîkarê Komara Îslamî dihatin hesabkirin, lê ji îro şûnda wekî terorîst tene naskirin, û wekî terorîstan wê serederî digel wan bê kirin, lewra eva dawî hişdarî ye bo wan Kurdan.

Di vir de careke din jî em dibêjin, ku me xeyrî Komara Îslamî tu dijmineke din tune. Di vê demê de, û di pêşerojê de jî, em naxwazin tu Kurdek wekî terorîst serederî digel de bê kirin. Her bi vê sedemê jî em daxwazê dikin û çavniheriya me ev e ku ev kesane, heya ku dereng nebûye, li endambûna hemû dezgehên serkutkar yên rejîmê bitaybet Spaha Pasdaran dûr bikevin, û hekî heya duh bi her sedemekê endamê wan dezgeh û navendan bûne, lê ji vir şûnda tu hincetek nemaye, çimkû tawana endambûn di saziyeke terorîstî de, bi tu hincetekê nahê pînekirin”.



## Sergotar

Faşîzm di kincê  
çep de

N: Kerîm Perwîzî

Bîr û hizra çep di bingeha xwe de pêk hatiye ji rexnegirî û li pey dadwerîketinê, lewra jî berdewam bîr û hizra wekhevîtiya di navbera mirovan de, û bi taybetî wekheviya neteweyan, ji xemxwarinên çepeke rastîn bûye. Lê di heman demê de rewî û pêvajoya ji rê derketinê hebûye, ku bi berçav xwe wekî çep nîşan daye, lê hekî em bi hûrî dikevin nava kûrahiya bîrkirin û bilêvkirinê, ew yek faşîzmek e ku di kincê çep de xwe veşartîye.

Di destpêka desthilat bideştvegirtinê ji aliyê rejîma Xomênî ve hinek rêxirawan çep hebûn ku seranên wan rêxirawan di bin navê şoreşgertiyê de palpiştîya stemkariyên rejîma Wilayeta Feqîh dikirin, û riya serkutkirina gelan û bi taybetî gelê Kurd bo celadên Ceylanê xweş dikirin, û piştî çar dehikan ku bi ser vê dîroka tal re derbaz dibe, hindêk ji paşmayiyên vî birokeyê ku bi berçav çep û di naweroka xwe de faşîstî ne, niha jî bi navên cur bi cur, her hêcetana bo berdewamiya desthilatdariya rejîma tawanbar ya Wilayeta Feqîh tînin.

Paşmayiya Rêxirawa Fedaiyan rewta bi nav “Ekseriyet”, ku 40 salan berî niha diketin pêş pasdaran bo serkutkirina xelkê, niha jî li ser bingeha kerb û kîna xwe ya kevn li Kurdistan û PDKÎ, daxuyaniyan diweşînin, û xembarî û perîşantiya xwe ji helwestên PDKÎ eyan dikin, û ew ji vî yekê daxdar in ku PDKÎ ragehandîye ku Spaha Pasdaran terorîst e!

Ew kesane ku di vî heyama dawiyê de, navê rêxirawa xwe guherîna bo Hizba Çep

## “Pêşmergeyên Bajar” çavniherê fermanê ne

**P**êşmergeyên Bajar li Merîwanê, bi boneya bi terorîst nasikirina Spaha Pasdaran a rejîmê, çalakiyên teblîxî bi rê ve birin.


Pêşmergeyên Bajar li “Kanî Dînar” a girêdayî bajarê Merîwanê, bi boneya bi terorîst nasandina Spaha Pasdaran a rejîmê, bo piştevanîkirin ji PDKÎ çalakiyên teblîxî lidar xistin.

Di van çalakiyan de, bi nivîsîna dirûşmên wekî: “Agehdariya Partiya Demokrat: Caşên Spaha Pasdaran agehdar dikin, hişdariya Partiya Demokrat: Caşên terorîst yê Spahê dev ji îxanetê berd in, bijî Partiya Demokrat, biherife rejîma îdamê, bijî PDKÎ, caşên terorîst yê Spahê vekîşin, bijî Partiya Demokrat”, hişdariyê didin xwefiroşan, û daxwaz ji wan dikin da ku heya dereng nebûye, bizivirin himbêza gel.

Herwisa gevirpoşên (xakîpoşên) Bajar, di berdewamiya çalakiyan de, peyamek rû li xwefiroşan belav kirin ku, deqa peyamê wiha ye:

Em çavniherê fermanê ne

Em pêşmergeyên Bajar, li



“Kanî Dînarê” pêşwaziyê ji peyama “Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê dikin, û amade ne li pêxema wê de jî, canê xwe bikin gorî.

Di vîr de em caş û mohreyên rejîmê re dibêjin ku: Eva derfeteke kurt e, û her wek Lêpirsyarê Giştî yê Hizbê gotiye: Êdî ti kesek nikare ji bo kiryarên terorîstan û hevpeymanên wan hêcetana bîne.

Axavtina me ya kurt ev e ku,

werin nav reza gel, hekî hûn neyên, hûnê rastî dadgeha gel bibin.

Bijî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Serkeve Rasan Rêkefta 27`ê Xakelêweyê, “Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, di peyamekê de, daxwaz ji xwefiroşan kir, da ku bizivrin himbêza gel, û xwe ji tawanên Spaha Pasdaran a terorîst bê par bikin.

ya Îranê (Fedaiyî Xelq) wisa dixuye ku hêştî jî di vî cîhanê de du dijminan nas dikin, Amerîka û PDKÎ, û di demê de ku Spaha Pasdaran dixin nava rêzbenda girûpên terorîstî de, ew bîr ji azarên xelkê ku ji deşt Spaha Pasdaran de kêşandine nakin, belku tenê li pey hêcetê digerîna bona êrîşkirina li ser PDKÎ.

Di daxuyaniya pîrr ji şerm ya xwe de, ku di 23`ê Xakelêweyê de weşandin, daxdariya xwe derheq helwesta PDKÎ eyan dikin, û bi dûr û dirêjî dixwazin ku vî kerb û kîna xwe ya dîrokî û paşxana faşîstî ya xwe di pêxema dildariya yekalî derheq Spaha Pasdaran di bin navên din de veşêrin.

Di daxuyaniya Hizba bi nav Çep ya Îranê de hewl hatiye dan ku dildariya xwe bo faşîzma Spaha Pasdaran veşêrin û hemû tawanên bixin stûyê Amerîkayê de, ku şerfiroş e û kêşeyan bo Îranê pêk tîne, û hêcetên bê navî bo helwestên xwe tînin.

Lê di hinek ciyan de bîrokeya xwe ya faşîstî derdixin, û di beşeke daxuyaniyê de dibêjin ku daxwazkarê veğerandina Spaha Pasdaran bo nav “padgan”an (binkeyên leşkerî) û helwestandina Spaha Quds in! Di rastî de bas ji hilweşandina Spaha Pasdaran û dadgehîkirina seranên Spahê û herifîna vî rejîmê nakin, wisa diyar e ku tenê kêşeya wan digel Spaha Quds e.

Di dawiyê de jî bi ew qasê bêşermî ve, bi terorîstnasîna Spaha Pasdaran şermezar dikin, ku ew yek kinçeke reş ya din ya dîrokî ye ku di karnamêya vî bîrokeya bi berçav çep lê di koka xwe de faşîstî dimîne. Hewldan bo domdarbûna temenê rejîmê beşdarbûn e di hemû tawanên rejîma Komara Îslamî de.



## Birêz Mistefa Hicrî peyamek rû li kirêgirtî û mohreyên girêdayî rejîmê belav kir

**M**istefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ di peyamekê de, ji kirêgirtî û endamên Kurd yên Spaha Pasdaran daxwaz kir, da ku vegerin himbêza gel, û êdî xizmeta rejîmê nekin.

Deqa peyamê wiha ye:

Her çawa ku hûn agehdar in, Amerîkayê, “Spaha Pasdaran a Şoreşa Îslamî” wekî saziyeke terorîstî daye naskirin, û ji niha şûnda wekî terorîst wê digel wan reftarê bike. Ew pêngava Amerîkayê wisa xuya ye ku di destpêkê de tenê ji aliyê wî welatî ve bê cîbicîkirin. Lê bi sebeba pêgeha Amerîkayê di nav siyasetên navneteweyî û aborî ya cîhanê de, wisa tê xuyakirin ku, di dawiyê de Ewropa û welatên din yên cîhanê jî tevî wê biryarê bin û wekî alîkarîkirin digel Amerîkayê beşên serekî yên Spaha Pasdaran bixin nav rêzbenda terorê de.

Sebeba vê ku di vê demê de ez rû li xelkê Kurdistanê dikim, ji ber vê yekê ye ku em hewlên xwe bixin ger, da ku hemû ew Kurdên ku bi her awayî alîkariya hêzên serkutkar yên rejîma Komara Îslamî bûne, wate endamên Kurd yên Spahê, ji vê saziya terorîstî dûr bixin. Ev jî vedigere ser heşt bi berpirsayetîkirina PDKÎ li hemberî hemû takên Kurd di Kurdistanê de. Em wekî Kurd li cîhanê û bitaybet di Rojhilata Navîn de, wekî hêzeke rizgarîxwaz, azadîxwaz û li dijî terorê hatine naskirin, her bi vê sebebê ye jî, hebûna endamên Kurd di nav refên Spahê de, dikare bandoreke xirab li ser rûmet û rûçikê neteweya me hebe.

Ji aliyekî din ve jî, reftarên Komara Îslamî bûye sebeba vê ku ev rejîma wekî metirsiyekê bo cîhanî bê hesabkirin, û pêşeroja wê, çi ji aliyê xelkê Îranê, û çi jî ji aliyê civaka cîhanî ve tarî be, û ber bi jinavçûnê ve biçe. Lê ji navçûna Komara Îslamî jî dibe destpêkek micid bo lêpîrsîna ên ku endam û



parêzerên vê rejîmê û bitaybetî alîkarê Spaha Pasdaran bûne.

Eva tê vê wateyê ku, Spah û tayên wê yên wekî, “El-Qa`ide”, “DAÎŞ” û herwisa saziyên cuda yên terorîstî, serederî digel wan bê kirin, yan jî rûbirûyê lêpîrsînê bibin, û di tu cihekî cîhanê de, ciheke ewleh bo wan nemîne, her bi vê sebebê ye jî ku di rewşeke wisa de, eva ku çavnehêriya endamên Spahê dike, tenê girtîgeh, koçberbûn, jinavçûn û lêpîrsîn di dadgehên dijî teror û komkujiyan de ye.

Her ji vir ve, li ser navê PDKÎ ez careke din rûyê axavtina xwe didim hemû wan kesan, bi taybet endamên Spaha Pasdaran yên Kurd ku li her cihekî bin, vegerin himbêza gel û nîstiman, heya ku dereng nebûye, xwe ji tawanên ji niha şûnda yên Spaha Pasdaran dûr bixin. Partiya Demokrat li ser bingeha bihêzkirin, qahîmkirin û paraştina kirameta mirovî a Kurd û xebat bo mafên wê ên neteweyî hatiye avakirin, û di vê

biyavê de siyasetê dike. Her bi vê sebebê ye jî ku naxwaze di siberojê de, takên Kurd bi navê terorîst bêne kelepçekirin, yan jî berbirûyê dadgehên dijîmîrovî bibin, çi li Kurdistanê û çi jî di cîhanê

wekî terorîst tene naskirin, û wekî terorîstan wê serederî digel wan bê kirin, lewra eva dawî hişdarî ye bo wan Kurdan.

Di vir de careke din jî em

dibêjin, ku me xeyrî Komara Îslamî tu di-jmineke din tune. Di vê demê de, û di pêşerojê de jî, em naxwazin tu Kurdek wekî terorîst serederî digel de bê kirin. Her bi vê sedemê jî em daxwazê

**Me xeyrî Komara Îslamî tu di-jmineke din tune. Di vê demê de, û di pêşerojê de jî, em naxwazin tu Kurdek wekî terorîst serederî digel de bê kirin**

de.

Hewce ye ên ku heya îro bi her hincetekê endamê Spaha Pasdaran bûne, vê bange-waza Partiya Demokrat micid werbigrin, çimkû piştê êdî tu kesek nikare ji bo kiryarên terorîstan û xulamokên wan, hêcetan bîne.

Komara Îslamî di heyama 40 sal temenê xwe de, hewl daye ku hindê Kurdên bînefs, wekî Caşpasdar, Besîc û ... hwd di Rojhilata Kurdistanê de birêkxistin bike. Lê, hekî ew kesane heya duh jî wekî alîkarê Komara Îslamî dihatin hesabkirin, lê ji îro şûnda

dikin û çavnehêriya me ev e ku ev kesane, heya ku dereng nebûye, li endambûna hemû dezgehên serkutkar yên rejîmê bitaybet Spaha Pasdaran dûr bikevin, û hekî heya duh bi her sedemekê endamê wan dezgeh û navendan bûne, lê ji vir şûnda tu hincetek nemaye, çimkû tawana endambûn di saziyeke terorîstî de, bi tu hincetekê nahê pînekirin.

**Mistefa Hicrî**

**27`ê Xakelêweya 2719`an  
Kurdî**

**16`ê Nîsana 2019`an Zayînî**

## Kurdekî welatparêz ê “Kurdistana Sor” koça dawiyê kir

Serokê “Kurdistana Sor” Wekîl Mustafayev roja 19.04.2019 wefat kir.

Kurdistana Sor (bi rûsî: Красный Курдистан, Krasniy Kurdistan; bi azerî: Qizil Kürdistan) otonomiya kurdên YKSS'ê ku di nava salên 1923 heya 1929'an de berdewam kiribû.

Kurdistana Sor projeyeka Lenîn bû, ku Lenîn beriya mirina xwe ew pêk anî. Ji bo kurdên di nava Azerbeycan û Ermenîstanê de dijîn herêmeke serbixwe ava kir. Lenîn alîkariya neteweyên kêmniyûs dikir ku di bin şovenîzma neteweyên zêde nîfûs de neyên piştavtin û li wan pêkutî neyên kirin. Ew cihên ku kurd lê dijiyan ji xwe cih û warê kurdan bû, ku ne bi koçberî hatibûn wir. Bajarên Laçîn, Qûbadlî, Kelbajar û ...hwd parçeyek ji axa Kurdistanê bûn.

Kurdistana Sor a ku 1923-an de li ser erdnîgarîya Kurdistana kevnar û dirokî de hatibû damezirandin û di sala 1929-an de bê sebeb tê rûxandin. Di sala 1937-a kurdê Kafkaziya bi fermana Stalîn bê sebeb, bê qanûn nava 24 seeta de li bin şert û mercên giran û dijwar de surgunî Asiya Navîn û Kazaxîstanê dikan.

Kurdistana Sor (ango bi tîpên kirilî, Көрдьстана Сор) ji aliyê Josef Stalin ve li ser daxwaza Tîrkiye û Îranê tê hilweşandin û kurdên herêmayên ku dewleta xwe diparêzin tên kuştin an sirgûnkirin.

Ji salên 1940-1950-î ji bo paraştina mafê gelê xwe ên siyasî, civakî, aborî, çandî Mehmedê Siloyê Bava dest bi têkoşînê dike.

Ku M. Barzanî tê Soviyetê (1947-1958) dema ku li Ermenîstanê nava kurda de digere, diçe mala Mehmedê Siloyê Bava. Babayêv bi Serokê kurdan M. Barzanî ra diçe qebûla serok komarê Ermenîstanê S.A.Tovmasiyan. Serok M.M.Barzanî ji wî

hivî dike ku jê ra soz bide ku salê 10-15 law û keçên kurd bê îmtîhan zanîngehê werên pejirandin. Lê S.A.Tovmasiyan sozê xwe bi cih nahîne. Bi daxwaz û tekîda M.M.Barzanî Babayêv sazî û rayedarên dewletêra nama dişîne û hivî dike ku wan ji sebebê nefikirina kurda agah kin. Bersiv naştine lê tîn jêra dibêjin careke din karê wehara mijûl nebe, Babayêv li mala xwe de Gêneralê kurd M.M.Barzanî re soz dide ku yê heya dawîya emrê xwe ji bo mafê gelê xwe, ji bo rastîyê yê berxwdanê bike. Berxwedaneka weha ne hêsan bû gelek cara mala wî digerin, tu zext, zor, aştengî, bandor, xeberdartî, dijwarî nikarin wî bidin rawestandî, gellek cara rayedarên dewletê jê ra radigihînin ku dest ji kurd-ayetîyê berde, lê ew vî karê pîroz bi bawerî heya dawîya emrê xwe berdewam dike.

Ji bo ku kurd mafên xwe ên windabûyî û pêpeskirî dest bînin, bizava M.S.Bava di salên 1989-90-î de li paytaxt bajarê Moskovayê da meşa lidar dixin. Di diroka Kurd û Kurdistanê de yekemîn car bû ku kurdê Soviyetê, meşê da bangî dewletê dikirin da ku mafên wan bidê, û bi serwêrtiya BABAYÊV daxwaza ji nûva avakirina Kurdistana Sor dikan. Di vê meşê da bi hewla Babayêv ji 9 komaran ên Yekîtiya Sovyêtê 2 hezar-an zêdetir Kurd beşdar dibin. Dewlet soz dide ku daxwaza kurda bîne cî. Lê desthilatdarên Yekîtiya Soviyetê agahdar dibin ku di navbera hin rewşenbîrên kurda de neqayîlbûn heye. Nivî bi rêbertiya Babayêv ji bo ji nûva avakirina Kurdistana Sor îsrar dikan, **çend rewşenbîr jî hevdu digirin û nama dewletê re dişînin ku Kurdistana SOR naxwazin.**

Rayedarên dewletê kurda ra radigihînin ku kengê kurd bi giştî bi yek biryar bin wî çaxî ewê daxwaza wan çareser kin. Weha kurd hevdu

ra ziman nikarin bivînin, hemberî hevdu radiwestin. Lê mixabin dem dibuhure. Di sala 1991-an de Yekîtiya Sovyetan hilweşiya, di erdnîgarîya Sovyetê da dewletên nû ên serbixwe pêşda hatin. Bi vî awayî ev armanc û niyeta Kurdistana Sor nehat sêrî. Belkî jî tewanbarê vê ew çend rewşenbîrên kurd bûn ku bibûn aşteng.

Di 1992-1993-an de tevî Qerebaxa Çîya, Kurdistana Sor jî di hêla Ermenîstanê ve tê dagirkirin. Mijara Kurdistan a Sor jî hêdî-hêdî mînanî dewleta kurd a Şeddadiya derbazî arşîva dirokê dibe.

Wekîl Mustafayev (1938'an li Qirgîzîstanê) pêşengê tevgera jinûveavakirina otonomiya Kurdan bû, a ku “Josef Stalin” xerab kiribû.

Binemaliya Wekîl Mustafayev bi reçe leka xwe digihîje hoziya (eşîreta) Koroxlî, ango Rewşan. Di sala 1937-an da ji ber siyaseta Stalîn û Panturkîstên Azerbeycana Soviyetê, malbata Wekîl Mustafayev, mîna hezar malbatên Kurdan, ji Kurdistana Sor hatibû aksorkirin (sirgûnkirin). Ew Kurdên Kafkasê di salên 1937-an û 1944-an da bi zorê ji xaka kal-bavan hatibûn veqetandin û di komarên Asiya Naverast – Kazakîstan, Kirgîzîstan, Tacîkîstan û Uzbekîstan – da hatibûn cîhwarkirin.

Wisa, Wekîl Mustafayev di sala 1938-an da li Uzbekîstanê ji dayîk bûbû. Di salên Şerê Cihanê yê Duyemîn da xwîşk û birayekî wî digel hezar zarokên Kurdan li Asiya Naverast ji birçibûnê mirin.

Lê piştî serdema Stalîn hinde pêngavên lîberal û internasyonalîst li Yekîtiya Sovyetê hatibûn avêtin û li ber zarokên Kurdên sirgûnkirî jî riya pêşdaçûna kesanî (şexsî) vebû. Wekîl Mustafayev di navbera salên 1955-an û 1963-an da jiyana xwe bi Artêşa Sor ya Sovyetê



**Wekîl Mustafayev di navbera salên 1955-an û 1963-an da jiyana xwe bi Artêşa Sor ya Sovyetê va girê da, û bûbû fermanar**

va girê da, û bûbû fermanar.

Ji sala 1963-an û virda Wekîl Mustafayev xebatkarê ewlekariya Sovyetê bû, û karên taybetî ji wî dihatine xwestin. Ewlekariya Sovyetê hemû xebatkaran ji bona operasyonan di dewletên biyanî da amade dikirin.

Wekîl Mustafayev gereke bişandana Çînîstanê, lê ewî daxwaza xwe ji bona xebatekê li Kurdistanê yan di nav Kurdan da diyar kiribû.

Pêştirî vê, Wekîl Mustafayev pêşniyara karmendên Sovyetê red kir, ligor kîjanê ew di karibû nasnameya xwe biguhasî û dewsa “Kurd” di xeta NETEWE da “Uzbek” yan “Tacîk” binivîsiya. Ne behetî ye, ku ji ber vê serhişkiya Wekîl Mustafayev, berpirsyarên ewlekariya Sovyetê kariyera wî xitimandin û wî şandine xebata hundurî Yekîtiya Sovyetê.

Di sala 1967-an da Wekîl Mustafayev beşa (fakûlteta) dadgeriyê li Zanîngeha Frûnze (paytexta Kirgîzîstanê)

»»» Dom R:6



## Îşkenceyên di Girtîgeha Diyarbêkrê de



**N: Bûbê Eser**

Gardiyan dibêje:

“Ew girtîgeha bi nav û deng ya bi navê 5 noluyê li ser rêya Sêwregê û li navça “Baxlara” de hatibû avakirin. Ew bi awayekî gelek modern hatibû çêkirin. Modernbûna wê ne ji bona ku girtî tê de rehet bin, berevajî wê ji bona ku em bikaribin bêtir lêdan û îşkencan tê de bikin, hatibû avakirin.

Ew modernbûna girtîgehê ne ji bona başiya girtiyan bû, eksê wê ew bi wê modernbûna xwe gelekî di elehê wan de bû. Ew modernbûna wê hêz û taqata me gardiyanan geştir, firseta lêdanê zêdetir dikir.

Ez li wê girtîgehê bûme mêvan. Êdî rojên min ê li wir derbas bibana. Di destpêkê de, gelekî kêfa min dihat ku êdî ez ji nobedariyê û ecemitiyê xilas bûbûm. Ji ber ku li vir êdî tu lêdan û nobedarî tunebû. Berevajî, li wir bi rehetî emirdayîn li wan mirovên xwenda û zana û îşkencekirina kesên di vir de, û di bin emirê xwe de şuxulandin hebû. Ez ê bi halê xwe yê cahîl li ser serê wan kesan bibama komûtan. Min ê li wir bikarîba, tiştê ku min dixwest bi wan bidime kirinê.

Li wir êdî min ê jî bikarîba emir û ferman bida. Êdî min ê bikarîba li wir, li wan kesên ku gelekên wan bi temenê xwe ji min mezintir, lêdan û îşkence bi wan bikira. Êdî ez ê bibama femandarek, min ê êdî li wan kesên xwenda û zana bidana ber dar û jopan, ma gelo kes hebû ku ji vê hebûna delal û berjewendiya



rind re bigotina na. Bi emirê “yuzbaşî” em 40 kesên nuh hatin girtîgehê, ku bibin gardiyanên wir. Dema em ji erebê daketin, “yuzbaşî” û çend leşker li dû wî hatin pêşiya me. “Yuzbaşî” dikeniya, bi awayekî kêfxweş nêzîkî me bû, yeko yek bi destê me girt û got:

-Hûn bi xêr hatin, vê dîbîstana ku gawiran dike musliman, komunîstan dike welatperwerê tirk, û ew kesên dibêjin em kurd in, dibin tirkên esîl. Piştî bi destê me girtinê, zîvirî ser çawişê kêleka xwe û got:

-Çawuş!  
-Bêje komûtanê min?

-Van hevalên nuh bibe cihên wan, dûre bila herin hamamê serê xwe bişon, îro îstirahet bikin û serê sibê bila bi we re derkevin, gera girtîgehê.  
-Temam komûtanê min, dibe. Rojtira din serê sibê em jî weke her kesekî rabûn ser xwe çûn cihê îstîmayê, (cihê ku leşker lê fêrî qa`îde û nîzama leşkeriyê dibin) li wir em diketin rêzê, yuzbaşiyê me destê wî li paş, seyê wî li dû, bi awayekî bi kêf hate ba me. Li me mêze kir, mizmizî, huştîyê seyê xwe xurand, dûre destê xwe di serî wî de da, hal û rewşa me pirsî, li gardiyanên berî me, mêze kir

û axift:

- Van hevalên xwe yên nuh hatine, li hemû girtîgehê bigerînin. Divê ew çend rojan li ba we bin, ku ew jî fêrî kar û barê girtîgehê bibin.

Berî ku em dest bi karê xwe yên muqades(!) bikin, wan em, ew kesên ku nuh hatibûn girtîgehê, li hemû derê wê gerandin. Berê ji salona ku mirov dikete hundir, dest pê kir. Li hemû salonan, qawîşan, hucran û cihên lêdanê gerandin. Dema em ketin hucre û cihên lêdanê xofekê ez girtim, tirsek kete nava min, ew kesên ku îşkence li wan dihat kirin hemû bûbûn heştî û çerm, min nikarîbû li wan mezê bikira.

Dema ku em digeriyan li alîkî dengê xwendina sirûdên leşkerî, li alîkî dengê lêdan û li alîkî jî dengê qêrîn û warîna kesan dihat. Gelek caran mirov ji wê rewşê dêşiya, lê ji bona ku em hîn bêtir li ser serê wan kesên girtî dîn û har bibin, çawişê bilokê li me mêze kir û digot:

- Gelî gardiyanan! Yuzbaşiyê me, her dem dibê ku bila zikê we bi van girtiyan neşewite. Hûn nizanin ku ew çi bela ne. Eger ji wan yek, we hin gardiyana li dereke tenê bigire, wê we bikujin. Ji ber ku

ev, ne mirov in, ew kesên xwedê nenas in, dijminê milletê Tirk in. Ê ev in yên ku leşker û polîsên me dikujin.

Ew axaftina çawiş, tesîr li ser me dihişt. Ew bûbû berdevkê Yuzbaşî, loma ew jî fêrî ajî-tasyonê bûbû. Wî carna weke yuzbaşî him tirs di me de diafirand û him jî rêya lêdanê dida ber me, ku em jî dest bi lêdanê bikin. Wî riya ku me di bin tesîra axaftina xwe de bihêle dizanîbû. Yuzbaşî ew kiribû pisporekî zîrek. Eger me jî weke wî nekira, him me lêdan dixwar, him jî bi vegera cihê ecemitiyê em dihatin tehdîtkirin.

Di destpêkê de, em her kesekî ku nû hatibûn, dane cem yekî, ku li wir gardiyan bû. Qederê çend rojan em weha li gel gardiyanan li qawûşan digeriyan. Ji bona ku em jî fêrî lêdanê bibin, gardiyanên berî me banî hin kesên girtî dikirin û ji me re digotin:

-De lê bide! niha dora te ye. Li gor wê, lêdan û êşkenceyên ku me li girtiyan dikirin, hîlbijartina ku kî wê li girtîgehê bibe gardiyan dihat kirin. Ew kesên baş lêdan nedikirin, şûnde dihatin vegeandin, yên weke min zalîm derketin, li wir man.

Ji ber rewşa min a ne qenc

»»»Dom R:6

## »»»» Doma R:4

qedand, û wek dadwer li bajarê Oş li Kirgizstanê deşt bi xebata taybetî ya dijî korûpsyonê kir.

Di sala 1970-î da Wekîl Muşafayev xwe kire nav meydana metirsiyê, dema ewî koma hevalbendên Koyçûmanov ji ber sedema korûpsyonê binçav kir.

Koyçûmanov merivekî pir bibandor bû, ji be ku ew pismamê Usubaliyev, Sekreterê Yekem yê Partiya Komûnîstên Kirgizstanê, bû, û kesî nediwêriya xwe bikira kirê wî de. Lê têkoşîna Wekîl Muşafayev bi ser ket û Koyçûmanov digel dostên xwe ligor biryara dadgeha Kirgizstanê hatibû cezakirin.

Nivîskarê binavûdeng Çîngîz Aytmatov û Serokwezîrê Kirgizstanê Sultan Ibragîmov piştgiriya Muşafayev kirin û xwaştin, ku serokatiya Partiya Komûnîsta Kirgizstanê ji dizan bihête rizgarkirin.

Lê Sekreterê Yekem Usubaliyev deşthilata xwe hişk girt û dijberê xwe Sultan Ibragîmov da kuştinê. Wê demê êdî Wekîl Muşafayev neçar ma, ku ji Kirgizstanê derkeve.

Di salên 1970`î-1980`î da Wekîl Muşafayev di polîsa Komara Autonom Kara-Kalpak da, ya beşeke Komara Uzbekîstanê ye, xebata dijî bertîlkirina karmend û siyasetmedaran bi rê vedi-bir. Wekîl Muşafayev yek ji wan kesên xizmetgozar bû, yên mezintirîn korûpsyona Sovyeta berê li Uzbekîstanê hilweşandin.

Bi vî cûreyî Wekîl Muşafayev tēkiliyên giring bi korên Moskovayê fermî ra saz kirin, û êdî bi vekirî karibû mesela berwelatê xwe li Kafkasê bîne rojeva siyaseta Sovyetê.

Cihê gotinê ye, ku ji sala 1981-an da, dema Wekîl Muşafayev şandine Komara Azerbeycanê, wî bi nû va xwe sipêrande pirsgrêka Kurd. Xebata wî li polîsa navçeya autonom ya Nexcewanê bû, ya di navbera Ermenîstan, Îran û Tirkîyê da ye, lê bi fermî beşeke Komara Azerbeycanê ye.

Nexcewan jî wek tē zanîn parçeyeke Kurdistana bû, li Başûr herêmên Kurdistana Rojhilat, li Rojava jî herêma Serhedê ye.

Bi sedan salan ew ji sê cemawerên etnîkî pêk dihat: Kurd, Ermenî û Tirk.

Ligor jimara deştpeka sedsala 20-an, li wir % 50 Kurd bûn, 40 % Ermenî û yên mayîn jî komên Tirkziman yên curbicur bûn.

Lê mixabin, piştî Şoreşa Cotmehê (Oktober) li Rûsiya, Nexcewan kete nav sînorên Komara Azerbeycanê. Mixabin, ramyara Azeriyan ya dirêjxayan gihîşte encameke wisa, ku niha li wir Ermenî nemane, Kurd jî yan hatin sirgûnkirin yan jî xwe wek Azerî binav dikin.

Bêguman, herêma Nexcewanê ji Wekîl Muşafayev ra giring bû, daku ew buhujandina Kurdan li Azerbeycanê vekolîne, û pilaneke vejînkirina şanaziya gelê me li Kafkasê bide ber xwe.

Balkêş e, ku berî avakirina Dewleta Sovyetê, herêmên Kurdan li Laçînê (Kurdistana Sor), Zengezûrê (li Ermenîstana îro), Nexcewanê û Serhedê bi hev ra girêdayî bûn!

Di meha Nîsana 1985-an da rewşenbîr û gundiyên Kurd li Ermenîstan û Azerbeycanê li kêleka Wekîl Muşafayev sekinîn, û nehiştin ku birêvebirên Azerbeycanê wî mîna “ekstremîstekî Kurd” ji xebatê derxin û careke din bişînin Uzbekîstanê. Heta

**Çend rewşenbîr jî hevdu digirin û nama dewletê re dişînin ku Kurdistana SOR naxwazin**

endamekî giring ji Wezîrxaneyê Dadê ji Moskovayê – navê wî Bajenov – bi xwe hate bajarê Bakû (paytexta Azerbeycanê) û kompoyên dijî Wekîl Muşafayev da sekinandinê.

Wextê di sala 1989-an da nijadpereştiya Kirgizstan, Ermenîstan û Kazakîstanê gihîşte asteke bilind, Wekîl Muşafayev bandora xwe bi kar anî, daku Kurdên li wan deran dijîn, zirara mezin nebînin. Herweha ew yek ji amadekarên rêxistina “Yekbûn” bû, ya armanca xwe-seriya Kurdistana Sor bi pêş dixişt.

Wekîl Muşafayev, xwediyê şeş xelat û nîşanên rêzgirtinê ji hukumeta Sovyetê, digel jin û zarokên xwe li Italiyayê bûbû penaber. Kebaniya wî jî fermanbareke polisê Rûsiyê bû, lê ji ber ku ew tev mesela Kurdistana Sor bûbû, wê jî xebata xwe winda kir. **Jêder: Wîkîpedia**

## »»»» Doma R: 5

û ji bo ku ez venegerim cihê ecemîtiyê, heta ku ji min dihat, min lêdana xwe qenc fikir. Min wer fikir ku dema yuzbaşî dibîhişt an wî bi xwe di demên kontrolên xwe yên bi dizî fikir didît, gelekî kêfa wî dihat, loma car carna banî min fikir û digot:

-Kurê min, li gor agahdariyê ku ez diştînim, tu ne mirovekî xerab î, eger ev rewşa te her dem berdewam be, tē li vir bimînî, û tu wê gelek diyariyan jî ji min werbigirî, ez ê te bikim “onbaşî”, an “çawîş”. Dema tu bibe “çawîş” tu ê pereyekî baş jî bigrî.

Tu wê bibî mirovê min yê yekemîn. Lê heta taliya

leşkeriya min, ne ez bûme mirovê wî ê yekem, û ne jî min tu me`aşekî zêdeyî hevalên xwe girt.

Dawiya dawî ez tē gihîştîm ku “yuzbaşî” ev yeka hanê ji her kesên ku wê bibana gardiyan re digot.

Wî ez maçî kirim, aferîneke qenc li min da, kêf bûbû kêfa min. Ez ketibûm, çavê yuzbaşiyê xwe. Êdî hêvî û baweriya min çê bibû ku ez ê li girtîgehê bimînîm. Bi kêf û eşqa ku ez ê li wir bimînîm, min êdî lêdan û îşkenceyên xwe hîn zortir û diwartir kirin. Berî ku rojên min ên ceribandnê biqedin, yuzbaşî banî min kir û got:

-Kurê min! tu weke ku ez difikirîm derket. Ez dikarim

bi awayekî rehet bêjim; rewşa te ji ya hevalên te cudatir e. Loma êdî ez dikarim te li vir bikim komûtanê qawişekê. Êdî ew qawiş wê ya te be, tu bi wan çî dikî, bike tu azad î. Daxwaza min ji te ew e ku bila tu carî zikê te bi wan neşewite.

Ew gişt, gawir in, dînsiz in, xwedê nenas in, ew dijminên welatê me, polis û leşkerên me ne. Em ew kesên li wê girtîgehê bûbûn gardiyan, bi her awayî azad bûn.

Çî tiştên ku me bixwaşt me dikaribû bikira. Xwarin û vexwarin pir û xweş bûn. Vexwarina araqê an jî kişandina esrarê ji alî yuzbaşî de hatibû serbestkirin, kişandin û vexwarina wan, ji alî wî de dihat dabînkirin.

Car carna wî digot:

-Di demên xwe yên vexwarinê de herin nava wan xwedê nenasan, wê gelekî baştir be. Wê demê hûn ê bikaribin baştir li wan bidin. Heta ku hûn fêr bibin, vexwarin ji bo we serbest e.

Wî her sibe, berî deştpeka kar, em hemû dicivandin, nesîhet li me fikir, wî bi xwe em fêrî lêdanê dikirin. Wî di axaftinên xwe yên serê sibana de, em bi kîn û nefretê dadi-girtin û bi ser wan kesên girtî de dişandin.

Bi wê kîn û nefretê me jî ew kesên di wir de hemû xayîn û dijminê gelê xwe didîtin. Di bin bîr û baweriyeke weha de dema me lêdan fikir, kêfa me gelekî dihat ku me dijminê gelê xwe dianîn ser rêya rast”.



## Nerîna Lîderan



Mik Pompeo:

“Emê bersiveke tund bidin rejîma Îranê, hekî berdewam be li ser destêwerdanên xwe di herêmê de”.



Demîrtaş:

“Hilbijartinên şaredariyan pey-ameke girîng bû bo Erdoxan”.



Kazim Sidîqî:

“Cehnemê de, ku dorpêçên aborî tundtir bibin”.



“Ruhanî”:

“Eger bendav nebana, wê bi hezaran kesî xendiqîban”.

## Rêzbendek li bînpêkirina mafê mirov li Kurdistanê hate belavkirin



**A**jansa Nûçegihaniya Kurd-Apayê, ku Ajanseke mafê mirovan e, navê kesên ku li Kurdistanê mafê mirov bînpê-dikin bo raya giştî belav kiriye.

Di vê rêzbendê de navê ev kesane hatine belavkirin ku, beprisên Dadwerî û Îtîla`ata rejîma Îranê li bajarê Sine ne. Di vê rêzbendê de navê berpirsên rejîma Îranê yên wekî: Cebârî, Ekber Cewherî, Kulîvend, Mucteba Şîrûd Bizorgî, Ebdula Dêhقان, Sadiq Samedî, Birayên Zari`î, Mehdî Ferzî, Azad Hikmet û Îsa nexî`î Kemalabadî hatiye, ev kesane li Kurdistanê mafê mirov bînpê dikin.

Cebârî serokê Hifazeta Dadweriya Kurdistanê, yek ji dirindetirîn û gendeltirîn dadweran e li bajarê Sine.

Ekber Cewherî, dadwerê navendî yê parêzgeha Sine; navbirî bo heyama 10 salan li posta xwe de tenê vajokarê tîmên lêkolînê yên

îtîla`at û îtîla`ata Spahê ye.

Kulîvend, dadwerê çavdêr li ser girtiyên navendî yên bajarê Sine û Heyderî serokê Navenda girtîgehê ye, ev du kesane mafê girtiyên siyasî û Eqîdetî bînpê dikin.

Mucteba Şîrûd Bizorgî, serokê Saziya Dadweriyê ya hêzên çekdar li Kurdistanê û navbirî sebebkarê serokê ye ku nahêle bo mijara kuştina kolberan, bidûreçûn bê kirin.

Ebdulah Dêhقان, berpirsê diyarîkirî ji aliyê Wezreta Îtîla`atê ye, ku di dadweriya giştî a bajarê Sine de kar dike, navbirî pevgirêkê (rabitê) di navbera dezgehên ewlehiyê digel tayên dadgeha Şoreş li bajarê Sine ye û roleke mezin di dosiya kesên siyasî de heye.

Sadiq Samedî, birêveberê Heraseta Te`awon, Kar û Rehetiya Civakî li Sine ye, navbirî di destpêka dehkên

70`î de li komîteyên Şoreşa Îslamî û piştî li Wezreta Îtîla`atê li parêzgeha Sine kar kiriye.

Birayên Zari`î, ev kesane ne ku her yek berpirsatiyên cuda hene, û li desteserkirina kesên jîngehparêz de rola serekî hene.

Mehdî Ferzî, cihgêrê Ferhengî û nûnerê Welîyê Feqîh li Sine ye, û tu xwendewariyek tune, lê, di hemû karûbarên kulturî û civakî de destêwerdanê dike.

Azad Hikmet, birêveberê giştî yê Îdareya Pêwendîgirtinê li bajarê Sine ye, û navbirî raasteraşt karê guhdarîkirina li tîkiliyên telefonî ên xelkê dike.

Îsa Nex`iyê Kemalabadî, serokê yekem yê heyeta paqijkirinê li Sine ye, ku raasteraşt ji aliyê Xamineyî ve hatiye diyarîkirin û li ser karûbarên navendan kar dike.

## “Mik Pompeo”: Qasim Silêmanî terorîst e

**M**ik Pompeo Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê got: Qasim Silêmanî berpirsê Spaha Quds a terorîst ku, tayeke ji Spaha Pasdaran li dervey welat, terorîst e.

Kanala Nûçegihaniya “Fox News” li gotûbêja di gel “Mik Pompeo” Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê pirs kir, gelo Amerîka Qasim Silêmanî jî, wekî Ebûbekir Bexdadî berpirsê girûpa terorîstî a “DAÎŞ”ê bi terorîst nas dike? “Mik Pompeo” di bersiva vê pirs-

siyarê de got, belê “Qasim Silêmanî terorîst e”.

Amerîkayê di heyama du rojên borî de, bi awayekî fermî Spaha Pasdaran a rejîma Îslamî a Îranê, xiste nav rêzbenda reş a saziyên terorîstî de. Donald Trump serkomarê Amerîkayê, piştî vajokirina gelaleya naskirina Spaha Pasdaran a rejîma Îranê wekî terorîst, di daxuyaniyekê de gotibû:

Rejîma Îranê ne tenê piştevaniya terorê dike, belkû Spaha Pasdaran bi awayekî çalakane di dabînkirina bûdceya wê de rol heye, û terorîzmê wekî alavekê bo hikûmetê bi kar tîne.





## Spaha Pasdaran kopalê destê rejîmê



rawê cîbicî nekiriye, parêzgarî ji welat û deskewtên gelên Îranê bûye, berevajî hertim wekî emrazeke serkutkar û kopalê destê axûndan hatiye bikaranîn.

Heta ew mifah jê wergirtin jî, bo dervey sînoren Îranê geşe kiriye, û bi armanca şandina derve ya şoreşê ku siyaset û stratejiya hertimî û naweroka hemû kar û siyasetên rejîmê ye di welatên din de, bi teror û kuştin û pêkanîna komkujiyan erk û wezîfeya xwe wekî baskê xulamokê rejîmê cîbicî kiriye, û bi hezaran kesî li



N: Cemal Fethî

**D**eshilatdarên dîktator û îdeolojîk bona vegeşandina deshilata xwe û sependina serweriya xwe hêzeke bawerpêkir ji xwe re ava dikin da ku di demên têngaiyan de wan bo armancên xwe bi kar bînin, û wekî baskeke serkutkar berdîncanê dijberên xwe.

Rejîma Îslamiya Îranê jî ku li ser destê komeke axûndên bêmeji hatiye avakirin, û yan jî baştir e ku em bêjin deshilateke dizîyî ye ku di pêxema wê de bi hezaran kesî canê xwe kire gorî, wekî hemû dîktatorên dirokê, her ji dema ku hate ser kar ve, ew baskê çekdar ji xwe re ava kir, û navê Spaha Pasdaran li ser danî.

Komara Îslamî di demekê de dest bi ser şoreşa gelên Îranê de girt, ku cîhan di nava du mezinhêzan wate Amerîka û Yekîtiya Soviyetê

de hate parvekirin, û her yek ji wan bona berfirekirin û vegeşandina deshilata xwe di cîhanê de bi giştî û herêma Rojhilata Navîn de mijûlî yargirî û rêxistina navend û girûpên weha bûn ku ji vê riyê ve bikarin hêsantir siyasetên xwe cîbicî û piraktîze bikin.

Îran ku di serdema rejîma paşatiyê de, di biyavê siyaseta cîhanî û herêmî de, zêdetir ji cemsera sermayedarî û Rojava nêz bûye, ew nêzikatî bû sedema vê ku hertim ji aliye cemsera sosyalîstî û Rûsiyê hewl bê dan ku hindêk alî ên wekî xwe di navxwê ya Îranê de bihêz bikin. Ew bîrokeya Rûsiyê jî piştî herifîna rejîma paşatiyê heya radeyekê ber bi piraktîzebûnê ve diçû. Jiber ku Rûsiyê di van çend salan de karîbû di navxwê ya Îranê de çendîn rêkxiraw û hizbên ser bi xwe pêk bîne.

Her ew rêkxiraw bûn ku karîbûn rewşê ji bo herifandina rejîma paşatiyê xwe bikin, ku aliyekî din ku karî dest bi ser şoreşa gelên Îranê de bigre, ji kesên tundrev û mêjihişk pêk hatibû ku bi diruşma “Ne Rojhilat, Ne Rojava, tenê Cimuriya Îslamî” dixwaştin ku di

herêma xwe de wekî cemsera sêyem bihesibînin, û bo van diruşman hewcehiya wan bi vê hêza kirêgirtî hebû ku tenê di xizmeta îdeolojiya axûndan de be, ne di xizmeta welat û hevvelatiyan de.

Ji ber ku cuda ji vê hêza taybetî ya axûndan welatê Îranê xwediyê hêz û arteşeke nîştimanî bû, ku cihê baweriya axûndan bû bona birêvebirin û cîbicîkirinma erk û fermanên rejîma Wilayeta Feqîh, bi vê lênihêrinê jî paşengeşekirina çend mehî, û rikeberî û nerazîbûna kesên wek Ayetullah Taleqanî û Muteherî û Sipehbod welî qerenî, di dawiyê de Xomeynî fermana avakirina Spaha Pasdaran da Şevra Inqilab, û ew yek jî bi kesekî bi navê Hesên Lahûtî hate spartin, û di roja 2-ê Banemera 1358-an de paş nêzî du mehan ku bi ser serkevtina şoreşa gelên Îranê re derbaz dibû baskê çekdarî û parêzerê rejîma Wilayeta Feqîh wate Spaha Pasdaran hate avakirin.

Herçend ku seranên rejîma Îranê wekî Xomeynî radigehandin ku armanca vê hêze parastina şoreşa gelan û welatan e, lê ya ku heya niha jî diyar e û heya niha vê rêxist-

welatên derdora Îranê, û kesên çekdar û çî jî kesên sivîl kiriye qurbanîyê zêdexwaziyan xwe, û bi avakirina çiqên curbicur wekî: Heşda Şe'ibî, Husiyên Yemenê û Fatimiyon û ...hwd hewl daye ku şer û nearamiyê ji xwe dûr bixe, û bi xweşkirina agirê şer di welatên Yemen û Sûriye û Îraq û Yemen û Efxaniştanê û ...hwd xelkê nerazî e Îranê hem di encama şerê navxweyî e Îranê bitirsîne, û hem jî xelkekê bêdeng û kirêgirtî ji wan ava bike, ku gotina ewlehî û emniyeta di Îranê de li jêr siya serê vê rejîmê de ye.

Herçend ku rejîma Îranê û Spah heya astekekê di siyasetên xwe de serkevtî bûn, û karîne dengê nerazîbûna xelkê Îranê di geviyê de bifetisînin, lê ya ku tê de serkevtî nebûn, cihgirkirina siyasetên dagîrkarî û dijîmirovî yên xwe di Kurdiştanê de bûye, jiber ku Kurd her ji destpêkê ve “Na” gotine vê rejîmê, û li Spaha Pasdaran wek rêkxiraweke terorîstî nihêrî ye, ku paş çil salan welatekî mezinhêz wekî Amerîka bi van hemû alavên pêşketî ên şer û vê hêza aborî ya bêmînak, karî pênaseya terorîstbûnê bide Spaha Pasdaran, ku di raştî de ew pênase, pênaseyek e ku kêrî vê rêkxirawê tê.



## Diyardeya îtiyadê di bajarên Kurdistan de zêde dibe

**R**eng û rûyê bajarên Kurdistanê Îranê, bi sedema hebûna diyardeyên civakî lekedar bûye.

Karnas û çavdêrên civakî yên Kurdistanê, bi rengekî nîgeran rewşa civaka Kurdistanê mêze dikin, û dibêjin nebûna pîlanên taybet û pîlansaziyên dirûst bo rûbirûbûna digel zîrêrên civakî yên wekî îtiyad di bajarên Kurdistan de ev digel aştengiyên micid rûbirû kirine û hekî navendên serbixwe hewlekê bo qutkirina van arîşeyan nebînîn, di pêşerojê nêzîk de, civaka Kurdistanê wê bibe qata kirîzên civakî.



Mamostayekî zanîngehê li Kurdistanê Îranê, di vê derheqê de ji malpera “Kurdistanmedia”yê, re ragehandiye ku : Mixabin heya niha tu amareke hûr û dirûst derheq rêje û temenê kesên ku tûşî îtiyadê di Kurdistan û Îranê de bûne ber dest nîne û dezgehên pêwendîdar jî amade nebûna amareke zelal di vê derheqê bidin, lê çavlêkirineke bilez bi ser rewşa bajarên Kurdistanê, vê raştîyê nîşan dide ku, Kurdistan rewşa kirîzê derbaz dike.

Li gorî gotina wî mamostayê zanîngehê ku nexwastiye navê wî eşkere be, bi eşkere gotiye ku temenê kesên tûşbûyî bi diyardeya îtiyadê, daketiye bo jêr 18 saliyê, û heya derbazî nav rêzên zarok, xwendîngeh, zanîngeh û hûnermendan bûye, ev cihane ku raştî vê diyardeyê bûne, bixwe bûne parek li arîşeyên civakê.

Li gorî amaran niha diyardeya îtiyadê, di Kurdistanê de berfireh bûye, û, komek xisarên micid lipey xwe tîne ku wiha ne: Zêdebûna gendelî, dizî, xazokî, leşfiroşî, nesaxiya Îdîzê û ... hwd.

## Di Îranê de zêdeyî 11 milyon kesî nexwendewar in

**N**avenda Lêkolînê a mecîlsa rejîmê di raporeke xwe de, derheq rewşa xwendewariyê di Îranê de, gotiye ku rêjeya kesên ku tu xwendewariyeke wan tuneye, nêzîkî 9 milyon kes in, lê amarên cihanî nîşan didin ku, ev rewşa zêdetir ji 11 milyon kesan e.

Navenda Lêkolînê ya mecîlsa rejîmê di raporeke xwe de gotiye ku, tevî hebûna 3 bername û pîlanên stratîjî bo qutkirina nexwendewariyê, niha nêzîkî 9 milyon kes nexwendewar di Îranê de hene, lê, amarên Banka Cihanî derheq vê pîrsê de ragehandiye ku rêjeya kesên xwendewar li hemerî hemû nifûsa Îranê di destpêka şoreşa gelên Îranê de %65 bûye, lê di sala 2016`an de, gihîştîye %85, û li gorî vê rêjeyê di Îranê de zêdeyî 11 milyon kes nexwendewar in.

Li gorî amarên “UNESCO” %2 ji ciwanên ku temenê wan li jêr 24 saliyê de ne, tu xwendewariyek tunînin, lê eva di demekê de ye ku, nexwendewarî di welatên derdora Îranê de, wekî Rûsiya, Azerbaycan, Ermensitan, Turkemniştan û Turkiye, kêmtir ji %1 û heta %0ê ye jî.

Li gorî van amaran zêdetirîn nirxa nexwendewariyê di Îranê de, di parêzgehên wekî Sîştan û Belûçîstan, Sine, Urmiye, Loriştan û Erdebîlê de ye ku, neteweyên zilmlêkirî wir akincî ne.



## Heyva Sor a Îranê alîkarîgihandinên welatên biyanî înkâr dike

**S**aziya Heyva Sor ya Îranê alîkarîgihandinên welatên biyanî yên bo lehîlêdayîyan înkâr dike.

Li gorî raporên belavbûyî, Saziya Heyva Sor rejîma Îranê di raporeke xwe de belav kiriye ku heya niha alîkariyên tu welateke biyanî negihîştîye destê me. Ew îdî`aya vê saziyê di demekê de ye ku, heya niha welatên wekî Heyva Sor a Efxaniştan, Tîrkiye, Federasyona navneteweyî a Xaça Sor û Heyva Sor, Xaça Sor a Almaniyayê, Heyva Sor a Kowêyt, Wezareta Rewşên neasayî a Ermensitanê, her yek ji van saziyên van welatan alîkariyên mirovî bo xelkê lehîlêdayî yên Îranê şandine.

Herwisa hejmareke welatên din jî îlana amadebûna xwe bo gihandina alîkariyên mirovî bo bajarên Îranê yên ku raştî lehiyê hatine kirine.

Ev gotinên saziya Heyva Sor a rejîma Îranê vê yekê nîşan dide ku, rejîmê ev alîkariyên welatên biyanî ku bo xelkê zirardîtî yên Îranê şandine, radeştî vê saziyê nekirine, û ev di embaran de xwedî kirine, û berpîrsên vê rejîma dirende û heya di rewşên wiha de jî, alîkariya xelkê xwe nake û tenê di fikra berîkên xwe de ne. Berpîrsên gendel yên rejîmê, hemû serwet û samana welat talan kirine, û niha jî alîkariyên mirovî yên welatên biyanî ku bo xelkê lehîlêdayî şandine didizin.



## Li Enqerê şanoyek li ser Seyîd Riza hat pêşandan

**H**eta niha gelek film û belgefilm li ser jiyana rêberê kurdan Seyîd Riza hatine amadekirin û gelek komên şanoyê jî yariyên şanoyê li ser serhildana Dêrsîmê û sêdaredana Seyîd Riza amade kirine.

Herî dawî li Enqerê girûpa Şano ya bi navê “Sîmurg” jî şanoyek li ser jiyana Seyîd Riza amade kiriye ku biryar e meha Gulanê li Almanyayê were nîşandan.

Li Enqerê tîmeke şanoyê bi navê Şanoya Sîmurg heye, tîm ji 9 kesan pêk tê û piraniya wan jî xelkê Dêrsîmê ne. Şanoya Sîmurg niha amadekariyê li ser yariyeke şanoyê dike ku behsa jiyan û serhildana Seyîd Rizayê Dêrsîmê dike.

Şanoger Miçê dibêje: “Em

zêdetir li ser nakokiyên di navbera eşîran de sekînin. Di yarîyê de li hin deran Seyîd Riza hêrs dibe, li hin ciyan bi kelacan qise dike.”

Yariya şanoyê 2 demjimêran berdewam dike û ji destpêkê heta sêdaredanê bi berfirehî behsa jiyana Seyîd Riza û hevalên wî, serokên eşîrên wê demê û bi giştî dost û neyarên Seyîd Riza dike.

Şanoger “Halîl Esen” behsa rola xwe kir: “Rola min a Baro Husên e. Ew kesekî nêzikî Seyîd Riza ye û dostekî wî ye baş e.”

Şanoger Songul Karagoz jî wiha behsa rola xwe kir: “Rola min jî Zarîfe Xanim e. Ew hevjinê Elîşêr e. Jineke jîr, zana, tekoşer û zîrek e û ew jî şer dike.”

Di şanoyê de heman demê behsa rola berpirs û rayedarên hikumeta Tirkîyê ya wê demê jî tê kirin.

Şanoger Melîh Yetkîn jî got: “Rola min yek ji berpirsên komkujiya Dêrsîmê ye. General Abdullah Akdoğan serokê firqeya 4 ya artêşê ye û di dema serhildanê de bi gazên kimyewî xelkê Dêrsîmê kuştîye.”

Seyîd Riza û kurê wî yê 16 salî Rêşîk Husên piştî serhildana Dêrsîmê ya li dijî dewleta Tirkîyê weke serkirdeyên tevgera Dêrsîmê 15ê Mijdara 1937ê hatibûn sêdaredan.



## Hunermenda Kurd êşa keç û jinên Kurdên Êzîdî kire tablo

**H**unermendeke Kurd a Rojavayê Kurdistanê, Nesrîn Ehmo ji Almaniya hate Hewlêrê û bi 15 tabloyan pêşangeheke tabloyan vekir ku têde êş û janên keç û jinên Kurdên Êzîdî nîşan daye.

Li bajarê Hewlêrê pêşangeheke hunera şewekariyê ji hunermendeke Rojavayê Kurdistanê re hat vekirin, pêşangeh bi navê Veguhertinê hat vekirin û bi tenê rojek bû, û 15 tablo têde hatin nîşandan.

Resama Kurd Nesrîn Ehmo dibêje ew bi rêya heştên xwe û bi rêya tabloyên xwe, bi awayekî hunerî balê bikîşne ser êş û trajedyaya keç û jinên Kurdên Êzîdî.

Nesrîn Ehmo bi staylê derbirînê êş û azarên gelê Kurd li ser tabloyan dikişîne. Di vê pêşangehê de ew bêhtir guh dide zehmetiyên ku keçên Kurdên Êzîdî raştî wan hatine.

Nesrîn ji bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê ye û ev çend sal in li Almaniya dimîne, heya niha di 19 pêşangehan de tabloyên xwe nîşan dane.



## Fêrbûna Kurdî ji bo Japonan hêsan dibe

**Y**ekem pirtûka rêzimana Kurdî ya bi Japonî ji Weşanxaneyê Nûbiharê derket. Pirtûka Rêzimana Kurdî ya bi Japonî ji 225 rûpelan pêk tê û ligel mijarên rêziman, beşa ferhengê jî tê de heye.

Mamoşteyê Zimanê Kurdî li Zanîngeha Lêkolînê Biyanî ya Tokyoyê Vakkas Çolak ji Rûdawê re ragihand ku wî

pirtûka Rêzimanê Kurdî ligel Prof. Dr. Abdurrahman Gulbeyaz û lêkolîberê Japon Takenori Murakami amade kiriye.

Vakkas Çolak: “Mijarên pirtûkê di asta bingeîn û navîn de ji 20 beşan pêk tê. Di pirtûkê de zimanê Kurdî û zaravayên wê bi minak û berewirdekirina ligel Japonî hatiye amadekirin.”

Çolak da zanîn ku di pirtûkê de

cih dane bikaranîna peywan li cihên cuda û herwiha cih dane peywen li gor herêman hatine guhertin.

Pirtûk ji du beşên sereke pêk tê di beşa yekemîn de behsa rêzimana Kurdî dike û di beşa duyem de jî ferhenga Kurdî-Japonî heye ku zêdeyî 2 hezar peywan lixwe digire.





## Zimanê Kurdî

Pijderî dibêjin : (Ma ba key : Bo çi bang dekey ? )  
Li vê gorê (çi + ma = çi + bo = bo + çi = bo çi) ye:  
Ji ber ku, li hindê herêmên Kurdistana navaşt û  
başûr dibêjin : (lo – çi) li şûna ku bibêjin : (çi- lo =  
çilo) .( ) Ev cînav jî neguhêbar e, di hemû raweyan  
de weku xwe dimîne û ji bo eşkerekirina sedema  
bûyîna bûyeran bikar tê. Wek : - Çima Reşo penaber  
bûye ? (Sedema penaberiya Reşo çi ye ?)

- Ev zarok çima digirîn ?  
(Egera giriyê zarokan çi ye ?)

- tu çima xeyidî yî ?  
(Sedema xeyda te çi ye ?) Berçav e ku (çima) bi wa-  
teya (çira, bo çi, ji bo çi) hatiye . Ev (çima) jî weku  
cînavên dîtir, carinan bêyî têgeha pirsîyarî bikar tê :  
Wek :

- Tu çima hatibî û xwesteka te jî çi be, ser çavan !
- Te çi kiribe, te çi nekiribe min ji te re negotiye  
çima !

“Çawa”:

Ev cînav jî lêkdayî ye, ji cînavê sade “çi” û bêjeya  
“awa” pêk hatiye . Cînavê “çawa” bi wateya (çi  
hawe, çi şêwe, çi reng, çilo) tê xebitandin û ji bo  
zelalkirina rewşa çawanî (hal) bikar tê.

Wek :

- Tu çawa yî ?  
(Ez baş im !)

-Bavê Zînê çawa ye ?  
(Bavê Zînê nexweş e !)  
-Reşo çawa pêşwaziya we kir ?

(Reşo bi rêz û rûmet pêşwaziya me kir)  
- Çawa cotyar genimê xwe diçine ?

( Cotyar bi dasê genimê xwe diçine)  
- Mêvanên we çawa çûn ?

( Mêvanên me, hin siwar çûn û hin peya)  
“Çawa” cînavê neguhêbar e (nayê guherîn). Li  
hindê herêmên Kurdistana (Efrîn, Soran...) cînavê

“çawa” sivik bûye û bi “ço” tê xebitandin : - Tu ço yî ? - Dost  
û heval ço ne ?

Ev cînav jî, gelek caran ji raweya pirsîyariyê tê der û weku her  
bêjeyê (bê pirsîyarî) bikar tê : - Rewşa te çawa be jî, herî divê  
tu biçî serdana

bavê xwe  
- Reşo çawa hatibe ne giring e, ya giring ew e

ku gihişte vir .

“Çilo” :

“Çilo” jî cînavê lêkdayî ye, ji cînavê pirsîyarî, yê xwerû “çi”  
û bêjeya “lo” pêk hatiye. Li gora ku Seyda Gêwê Mukriyanî  
di ferhenga “kurdistan” de( ) destnîşan kiriye, ku ev “lo” di  
şêwezarê Rojbeyanî de( ) bi wateya (reng) tê xebitandin. Bi vê  
wateyê jî Rojbeyanî dibêjin : (Zerdelo, reşelo) . Seyda Mukri-  
yanî pê de diçe û dibêje : - Zerdelo : Rengê zerde (rengê zer)  
. - Reşelo : - Bo kenne – (anku, bo tinaziyan ji kesê rengereş  
– esmer – re tê gotin “reşelo”. Li herêma me (Sûriyê), çivîkeke  
reş û pitpitkî heye bi navê (Cîq, Çîq) tê nasîn . Ji wê çivîkê re  
tê gotin “reşole” û hin jî dibêjin “reşêlê” . Vêca ku em cihê her  
dû tîpan (o, e) ji gotina (reşole) bi hev biguherin, hingê gotin  
dê bibe (reşelo), anku (reşereng). Hevguherîna cihê tîpan jî  
di zimanê kurdî de bi pirranî hatiye . Di ferhenga Kurdistan,  
rûpelê (844)ê de gotina (lo çî, bo çi) hatiye. Vêca eger (lo) bi  
wateya (reng) be, gerek (lo çî) bi wateya (reng çi) be, û (çilo)  
bi wateya (çi reng) be . Ev cînavê lêkdayî, bi şêweyekî pirsî-  
yarî rewşa çawaniya bûyîna karan zelal dike. Wek : - Çilo te  
pênûsa xwe şikand ?

( Şikandina pênûsê çawa bû ?)  
- Mêvanên we çilo çûn ?  
( Çûna mêvanan bi çi rengî bû ?)  
- Em ê çilo armancan pêk bînin ?  
( Pêkanîna armancan dê bi çi şêweyî bibe?)  
- Tu çilo hatî malê ?  
( Tu siwar hatî, peya hatî, bi tenê hatî, bi  
hinekan re hatî, ka tu çilo hatî...??)

Diyar e ku di van mînakên de bersiva cînavê “çilo” rewşa  
çawaniyê berçav dike. Anku, dide zanîn, ka ew bûyer çawa  
qewimî ye. Pirs û bersiva “çilo” bi kurtebirriyeke gelêrî tê  
gotin : - Çilo (çi – reng) ? – wilo (wiha reng) . Cînavê “çilo”  
jî neguhêbar e, di hemû dem û raweyan de nayê guherîn. Ev  
cînav jî, gelek caran bêyî têgeha pirsîyariyê bikar tê .

**Dom heye...**



## Rêz ji “Kanîmal” û xebata wî hate girtin

**A**kademiya Kurdî li Kurdiştana Başûr, rêz ji xebat û tekoşîna Kelîmullah Tewehudî dîroknivîsê Kurd ê Xurasanê girt.

Nûçegihanê malpera Kurdiştanmedia ragihand ku roja Duşemiyê 2’ê Banemerê, di semînameke rêzgirtinê de, a bi navê Kurdiştaniyek ji Xurasanê ku ji aliyê Akademiya Kurdî ve li Hewlêrê bi rêve diçû, bi beşdariya hin kesatiyên siyasî, dîroknas û mamosteyên wêjeya Kurdî, rêz ji Kelîmullah Tewehudî naskirî bi “Kanîmal” hate girtin.

Di rêûresmê de şandeke Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi serpereştiya Mihemedsalih Qadirî berpirsê pêwendiyên PDKÎ li Hewlêrê jî beşdar bû. Rêûresm bi çend xulekan bêdengiyê jî bo rêzgirtin ji ruha pak a şehîdên Kurdiştanê deşt pê kir.

Piştî Necatî Ebdullah cihgirê rêveberê Akademiya Kurdî, behsek li ser girîngiya zimanê Kurdî û aştengiyên li hemberî bi fermînasandina zimanê Kurdî pêşkêş kir. Mihemed Heme Baqî endamê Akademiya Kurdî jî behsa girîngiya rêzgirtin ji dîroknivîsên Kurd kir.

Di beşeke din a semînarê de jî Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê herêma Kurdiştanê behsek di derbarê ziman û çanda Kurdî de pêşkêş kir.

Piştî Rêbwar Siweylî sekreterê Akademiya Kurdî, deqa biryarnamê rêzgirtinê ji Kelîmullah Tewehudî jî bo beşdaran re xwand.

Di berdewamiya semînarê de, lewha rêzgirtina ji xebata “Kanîmal” bo zindîragirtina çanda Kurdî li Xurasanê, ji aliyê Nêçîrvan Barzanî û Pro. Ebdulfetah Botanî rêveberê Akademiya Kurdî ve pêşkêşî Kelîmulla Tewehudî hate kirin.

Di beşa dawiyê de Kelîmullah Tewehudî di derbarê zulm û zoriya dagirkar li Kurdên koçberkirî jî bo navçeyên din ên Îranê de, gotarek pêşkêş kir, û got ku ew hewl jî bo jinavbirina ziman, çand û debên Kurdan bûne.

Kelîmulla Tewehudî naskirî bi Kanîmal sala 1320’î a Rojî (1941’an a Zayînî) li Oxaziya Şêrwane li Xurasanê jî dayîk bûye.

Ew, xwediyê 15 pirtûkan di warên dîrok, çand, wêje û mûzîka Kurdî de ye. Hin ji berhemên wî ev in; Kilîder di belgenamêyên dîrokê de, Koça dîrokî a Kurdan ji bo Xurasanê, Stranên Kurmancî, Darê çil deştan, Nadir Sahîbqîran, Ce’îferqulî Zengulî, Melêkuşo’erayê Kurmanc, û Mafûra Kurdî li Xurasanê.



## Asta betaliyê di Rojhilata Kurdiştanê û Îranê de bilind dibe

**D**i Îranê de bi sedemên wekî bilindbûna nirxan û nebûna kar, asta betaliyê heya %25.5 jî bilind bûye.

Li gorî raporên navxweyî yên rejîma Îranê ku dane xuyakirin, di Îranê de, betalî gihîştîye astekekê ku metirsîdar e û asta betaliyê % 25.5 zêde kiriye, bi taybet ciwanên temen 15 heya 29 salî betal in. Di Îranê de, sedema zêdebûna rêjeya betaliyê vedigere bo rewşa xirab a aboriya Îranê û herwisa daxîstina sînoran ji aliyê hêzên leşkerî yên rejîma Îranê. Herwisa di Rojhilatê

Kurdiştanê de, betalî gihîştîye %80, çimkî kareke wisa nîne da ku, xelk bikarin mijûl bin û dahata jiyana rojane ya xwe dabîn bikin.

Di Rojhilatê Kurdiştanê de, pîrraniya xelk li ser sînoran mijûlî kar û peydakirina pariyek nan bo malbata xwe bin, lê piştî ku sînor hatine daxîstin, wan çavkaniyên dahatê jî ji deşt dan.

Parêzgehên Rojhilata Kurdiştanê, li gorî erdingariya wê gellek çavkaniyên wekî çandinî, petrol, gaz û qîra sirûştî heye, lê ji aliyê pêşkevîna aborî û asta

dahatê wekî parêzgehên herî paşketî tînin hesabandin, lê rejîma Îranê bûdceyeke kêmtir ji wan parêzgehan re diyarî dike û herwiha pirojeyên mezin û stratîjîk di wan parêzgehan de cîbicî nake, da ku bibe sedema kêmbûna asta betalî û zêdebûna dahata xelkê.

Xelkê Rojhilata Kurdiştanê ji ber rewşa xirab ya aborî û betaliyê, bi neçarî bo dabînkirina dahata jiyana xwe, li ser sînoran karê kolberiyê dikin, ku yek ji zehmetîrîn kar e di cîhanê de, û gellek caran jî kolber bo pariyek nan neçar dibin da ku, dehan kîlo bar bi piştî xwe bar bikin û dehan kîlometran bi piyan rê herin, her bi sedema vî karî jî, gellek caran raştî hêzên leşkerî yên rejîma Îranê dibin û canê xwe jî deşt didin yan jî birîndar dibin.

Xelkê Rojhilata Kurdiştanê û Îranê, ji ber bilindbûna nîrxên tiştan di bazaran de, û nebûna kar, şiyana dabînkirina hewcehiyên jiyana xwe û malbata xwe nabin.

